

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 121)* *Sal 21* *Pûşber 2016 z - 2628 k* *Buha (75)L.S*


## Da`iş û El Nusra xwedî roleke sereke ne...
## Emerîka û Rûsya naxwazin rijîm hilweşe...

***((Ji hevpeyvîna Sekreterê Partiya Yekîtî ya Demokrar a Kurd li Sûryê (PYDKS) bi Rojnameya Newroz re -Entab- hejmara 23.05.2016an, ya bi kurdî tirkî derdikeve û li seranserî Tirkiyê belav dibe)).***

***((Ji ber dirêjbûna hevpeyvînê, me rê da xwe ku hin pirs û bendikên bersivan jê biweşînin))***

**Desteya sernivîser**

**1- Rojnameya Newroz- Birêz Şêx Allî, hûn dikarin di destpêkê de, derheqê xwe û partiya xwe de agahî bidin xwendevanê me?**

M.Şêx Allî – Di danasîna partiyê de: partiya yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê – PYDKS – ji ber gelek sedeman, li seranserî herêmên Kurd li bakurî Sûriyê (Cizîr, Kobanî, Efrîn) herweha li bajarên weke Heleb, Şam, Latakiya, Reqa û Hemayê, xwedî hebûneke rêxistinî, dîrokî û berdewam e, herweha rêxistinên partiyê li gelek welatên derve jî cî digrin. Û ji ber hinde egerên sereke, di nav xelkê de bi çavekî rêzgirtî lê tête nirîn. Ji wan egeran ..........❷



" Ruxandina Da´işê li Munbicê berdewame "

## Têkoşîna Çekdarî Li Rojhilatê Kurdistanê



Piştî 23 salan ji rawestandina şer, Partî DemokratÎ Kurdistan-Îran dîsa dest bi şerê çekdarî kir. Sekretêrê partiya PDK-Îran rêzdar Mistefa Hicrî di hevdîtinekê bi hevalên partiya xwe û girseyeke mezin ji dost û alîgirên partiyê re axivî, û bang li gêncên Kurdên Kurdistana Îranê kir ku derbas nava refên pêşmergeyan bibin û ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd, dest bi berxwedana çekdarî bikin.

Çalakiyên çekdarî yên biçûk ji berî bi salekê têne kirin, lê li gora endamê komîta navendî ya partiyê rêzdar Kawa Ciwanmerdî, ew çalakî wê fere û mezin bibin, û got jî, li ber heyam û ronahiya ......❼

## Di pazdemîn salvegera damezrandina wê de.. Ronîkirin li ser Komela ciwanên Kurd li Sûryê (komele)

**Mihemed Zekî Mihemed.**

Piştî xebata bêtr ji salekê di hemî herêmên kurdî û deverên ku kurd lê dijîn de, li ser pirojeya avakirina çareçewkê ji ciwanên kurd re, ewên ku roj bi roj bê vîna xwe ji civak , çand û kelepora kurdî dûr diketin, û di bin fişarên rijêmê de li dibistanan, ew tevlî (Şebîbete Esewra) û partiya Be'is dibûn. .....❾

**Hevpeyvîn ... Dûmahîk**

even he ne:

a- Partiyeke antî-şiddet e, aştî, azadî û wekhevî jê re diruşim û bingeh in, û di vê çerçewê de, xebat û têkoşîna di ber hebûn û berjewendiyên gelê Kurd û çareserkirina pirsa wî ya netewî de bi şêweyên aştiyane di çerçewa parastina yekîtiya Sûriyê de, rê û navnîşan e. Herweha PYDKS xwedî sondeke nivîskî û pirogramek siyasî ye.

b- PYDKS partiyeke serbixwe ye, lewre jî, di xirecir û nakokiyên di navbera partiyên Kurdistanî de, duh jî, îro jî, nebûye berdevkê partiyekê li dijî partiyeke dî. Û di vî warî de hergav hewil daye ku, di riya diyalog û hevdîtinan re, lihevkirin çê bibe, da ku, li ser riya yekrêziyê gav bêne avêtin û şerê navxweyî serî hilnede…..

Di warê danasîna kesayetiyê de:

Mihyedîn Şêx Allî li 1968 tevlî tevgera siyasî ya Kurd li Sûriyê bû ye. Ji ber xwendekarên Kurd ve li Helebê hatiye hilbijartin û li havîna 1972 an li Kurdistana Îraqê beşdarî kongira yekemîn a partiyê dibe, û ji hîngê ve bê rawestan di xebatê de berdewame. Bi kurdî û erebî dinivisîne, û di gelek rojnameyên erebî yên navdar, weke Elnahar, Elsefîr, Elhayat … HWD, di derbarê rewşa Kurd de nivîsî ye. Çi li Helebê di salên 1969 – 1973, li ba nemir Dr.Nûrî Dêrsimî û çi li salên 1980 – 1993 li şamê li gel Apo Osman Sebrî, xwe weke şagirtekî didît.

Li bajarê Efrînê sala 1953 ji dayîk bûye û li dibistanên bajêr û zanîngeha Helebê beşê Edebiyatê xwendî ye.

**2- Di sedsala peymana Sykes -Pîcotê da, li pirsgirêka Kurdîstanê hûn çawa dinerên?**

……Li Rojhilata navîn, piştî têkbirina peymana Sever û bi serxistina peymana Lozan 1923, û di siha tabloya siyaset û berjewendiyên navdewletî yên stratîjîk de yên ku piştî şerê cîhanê yê duwem 1939 – 1945 û damezrandina saziyên Yekîtiya Netewan (YN), pêvajoyên kapîtalîzmê û têkçûna sîstema Sovyêtî û rijîmên dewletên hevpeymana Warsoyê û bandora globalîzmê … Êdî pirsa Kurd û Kurdistanê bi rewş û pêvajoyên her çar dewletên endam di YN de (Turkiya, Îran, Îraq û Sûriya) hate girêdan, û bû girêkeke dijwar û pirsek serekî ji pirsên wan her çar welat û dewletan. Dikarim bêjim, jinavbirin, binpêkirin û herifandina van sînorên fermî yên navdewletî ku ji hêla dezgeh û zagonên YN ve hatine kolan û neqişkirin, û bi gelek peymanan ve hatine girêdan û pejirandin, ne bi dilhezî, xwezî û hêviya ne, ne jî barê partiyeke siyasî û civaka sivîl e. Pirsgirêka Kurdistanê ne pirsgirêka hinde giravên biçûk di navbera Rûs û Japonan de, an di navbera Turkiya û Yonanîstanê de ye. Lewre, di nêrîna me de, çareseriya li ber me ya erênî û mumkin, cîbecîkirina maf û nasnameya netewî ya gelê Kurd di makzagona (Distûr – Anayasa) dewletê de û di çerçewa sîstemeke demokratîk, nenavendî û Federal de ye, da ku Kurd bi xwe, xwe birêve bibin û ligel pêkhate û gelên dî, bi dostanî û aştiyane bijîn, nirx û pêdiviyên pêkvejiyanê bidine pêş û biparêzin, da ku, mil li mil, li beramber pirojeyên golvedan û hovîtiya Îslamî siyasî ya nijadperest, malxur û faşist rawestin.

**3- Li ser şerê Sûriye ra pênç sal derbas bûye. Lê hê jî rejîma Baasê hilneweşiya, sedama vîya gor we çî ye?**

Kirîza Sûriyê bûye navnîşana şerekî navedewletî, ku gelek hêz û dewlet ciyê xwe tê de girtine, û êdî bandora wê ne tenê li derdora Sûriyê dibe û bûye, herweha li berjwendiyên Awropa û têkliyên Rûs û Emrîka dibe. Û ji ber ku opozisyona Sûrî belawela, nelihev û di destên dewletên biyanî de ye, û hêzên îslamî yên tund û tûj, weke rêxistina Da'iş û – şebekeyên El-Qa'îde li welatê Şamê – Enya El-Nusre û biramak û alîgirên wê li ser piraniya xaka Sûriyê xwedî roleke sereke ne, lewre, Emrîka û Rûsiya naxwezin rijîm hilweşe, da ku derfet ji vê reng opozisyonê re peyda nebe û rewş aloz û kambaxtir nebe, û pirsa aştiya navdewletî nekeve tehlûkê. Lê mirov di wê baweriyê de ye ku pêşeroj ne ji rijîma Baas re ye, ji ber ku kujerê gelê xwe ye.

**4- Bi piştgirîya Rusya û Îranê rejîma Baasê, Helebê ji nû ve bistîne, encamê wê ê çawa be?**

Çendî di navbera Rûs û Emrîka de nakokî hebin, lê di derheqê rewşa Sûriyê de têgihaştinek hevpar heye, û civînên Cinêv û Viyena, herweha biryar û daxuyaniyên Encûmena Ewlehî ya navdweletî berhemên lihevkirina her du wezîrên derve Lavrof û Kêrrî ne.

Bajarê Helebê xwedî taybetmendiyeke dîrokî ye, îro nîviyê bajêr ji alî rojava di destê rijîmê de ye, û nîviyê ji alî rojhilat di destê mucahîdînan de ye, û beşek ji alî bakur, taxa Kurdan Şêx Meqsûd di destê Yekîneyên Parastina Gel de ye YPG – YPJ . Vêca, bona cîgeh û taybetmendiya Helebê, Rûsya nalezîne û li gor hinde nêrîn û tektîkên Tehran û Şamê tevgerê nake, ji ber ....

11

# Gelê Kurd... Gef û Metirsî

Newafê Bişar

Li cîhana me ya îro, di civakê de, tu rêz û rûmet ji qels û sêfîlan re tune ye, çi wekû tekekes, yan jî wekû gel. Her kes dizane ku xurtiya gelan jî bi yekîtiya kesên wan pêk tê, ango ew gelê endamên wî ne hevgirtî û dilêşên hev bin, ew nikare berevaniya xaka xwe bike, û xwe li ber êrîşên hêzên xurt bigire, bi demê re, ew azadî û rûmeta xwe jî winda dike, nîrê bindestiyê dikeve stoyê wî û jiyana koletiyê dijî.

Mixabin! Îro gelê me yê Kurd li rojhilata navîn yek ji gelên bindest tê jimartin, wî azadiya xwe winda kiriye, û di bin destê desthilata dewletên deverê ji Tirk, Ereb û Firsan de dijî. Ji ber van merc û hoyên dijwar ku gerdûn li serê wî teng kirine, û bi armanca dermankirina birînên wî, bi kurtî be jî, pêwist e em rewşa wî ya rêzanî di ber çavan re derbas bikin, xem û kulên wî bidêrin û li gora têgihiştina xwe, çareseriyê ji wan re destnîşan bikin.

Piştî ku gelê Kurd rabûye ser piyan û bi dengekî bilind daxwaza mafên xwe yên netewî dike, dagîrkerên welatê wî jî bi tundî bersiva vê daxwazê didin û bi her hawî tevdigerin da vî dengî bibirin, û dîsa weke her car hewil didin ku bi agirê nakokî û berberiya Kurdan û mijûliya wan bi şerê navxweyî, rê li ber wan winda bikin, vê derfeta zêrîn û lihevhatî ji dest wan birevînin, da ku dîsa weke berê ew di bin



nîrê sitemkariya reş de binalin û bikalin.

Mirov bi bi hêvî ye, ku birayên me yên xoşewîst dilên xwe ji şirovekirina me negirin û vê nerîna me mîna nerîna birayekî dilsoz bihejmêrin, ji ber ku bi rastî jî em xêrxwazên wan in, çiku doza me li her çar parçeyên welêt bi hev ve girêdayî ye. Dema birayên me li parçeyekî azad û serbest bijîn, di civaka gelan de xwedî hêz, rûmet û cihekî berz bin, ben li stoyê me jî sist dibe, û hêviyên me berew jiyaneke azad geş dibin.

Mixabin ku ev e demeke li başûrê welêt, Herêma Kurdistana Îraqê, rewşa rêzanî di astengiyê de ye. Kirîza serokatiya herêmê û perlemana Kurdistanê roj bi rojê aloztir û kambaxtir dibe. Hêz û partiyên siyasî yên herêmê bi rêyên hevdîtin û guftûgoyê van pirsan çareser nakin û her diçe, xêrnexwazên doza gelê me, van nakokî û hevrikiyên hûrik mezin dikin û pif dikine vî agirî da ku rivîna wî bilind bibe, û hêvî û xewnên me bişewitîne..!

Di vê dema hestiyar de ku li hawîr me neyar in, ji rêxistina terorist a Daişê de bigre û ta gelek dewletên herêmê, yên ku bi çavên neyartiyê li me temaşe dikin, û dixwazin ezmûna demokratîk û destkeftiyên başûrê Kurdistanê têk bibin û binax bikin, derz û terk dikevine dîwarê lihevkirina Kurdan!..

Di nerîna me de, pirsa herî giring a ku doza gelê me ji metirsiyan diparêze ew e, pêwist e em bi hev re danûstandinê bikin, pirs û gelcên hene bi hişmendî û biratî, di çarçewa berjewendiya gelê xwe de çareser bikin.

Li hêleke din, mixabin ku li rojavayê welêt, rewşa me jî têkilhev e. Li vî beşî jî, tevgera me ne li hev e, û li ber şek û pekên nakokiyên xwexwetiyê ye!.. Gelê me ji ber siyasetên Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ya ku xwe bi Îtalfa Istenbolê ve girê daye, xweseriya biryara xwe winda kiriye û şerê PYD ji xwe re kiriye karê sereke, rewşa rêzanî li heremên me aloz kiriye û yekrêziya tevgerê bi şûn de daye.

Ji hêla xwe ve, desthilatdariya rêvebiriya xweser jî, bi girtin û zindankirina hin de endamên partiyên siyasî yên ENKSê, ...

7

# Rêjîma olperest li Îranê Çi Dixweze?



Merwan Berekat

Li Îraq, Sûrî, Yemen, Kendava Erebî û Libnanê destêwerdaneke leşkerî û ne rewa û eşkere ji aliyê dewleta Îranê ya olperest ve hatiye kirin, û di encama vê destêwerdanê kuştin, qirkirina jiyanê û tevleheviyeke bê serûber tê kirin. Ji aliyekî din ve, tomargeha dewleta Îranê ji piştgirî, alîkariya hêz û kiryarên terorîstî çi di hundirê Îranê de, çi jî li dervî sînorî wê têr dagirtî ye. Eger hin aliyên navdewletî û herêmî ji bilî vê nirxandinê wê dibînin, zor pêwîst e ku ew li hember rêjîma Îranê li siyaseta xwe vegerin.

Eger ne heftane be, di her mehekê de çend kes ji çalakvanên siyasî, yan hevalên partiyên ku ji rijîmê re rikber in, an jî kesên ku rikberiya hevalbendên rêjîma Îranê dikin, ku piraniya van kesan jî Kurd in, ji aliyê rêjîma olperst ve tên bidardekirin. Yanê, ne veşartî ye, ku rêjîma Îranê rêjîmeke xwînî, kujer, hevalbenda terorîstê ya ku dijîtiya azadiya gelan û hêminiya Rojhilata Navîn û cîhanê dike ye. Hemû ev kiryarên ne rewa yên ku rêjîma Îranê di dermafê gelên herêmê de dike, hemû saziyên mafê mirovan û hêzên navdewletî li hember wê bêdeng dimînin, eger deng jî bi xwe xistin ew pir şermok e. Ji ber wê jî, roj bi roj rêjîma Îranê destên xwe çep û rast û bê tirs dirêjî piraniya dewletên herêma Rojhilata Navîn dike. Eger sîwaneke ji çavgirtinê ji aliyê civaka navdewletî ve ji destêwerdan û kiryarên rêjîma Îranê re tuneba, û ew hatiba veçengandin, ma gelo ev destdirêjî û terorîsta dewleta Îranê digihîşte vê astê?!

Eger rayedarên Îranê xewna dewtela Sefewî di serê xwe de mezin dikin, an jî dixwezin serweriya Rojhilata Navîn bikin, bêguman ev xewneke pûç û mirî ye, û dîrok nema vê xewnê dimêjîne. Rastiya rêjîma Îranê ya olperest di herêmê de şerê mezhebî gur dike, û dijîtiya azadiya gelan û ya hêminiya herêmê dike.

Rêjîma Îranê ji destêwerdan û kiryarên xwe yên ku serûberê piraniya dewletên herêmê xistine tevleheviyeke mezin têr nebûye, vêca çavsoriya xwe li hember Başûrê Kurdistanê jî xuya dide. Ev bi xwe tê wateya ku serê rayedarên vê rêjîmê çi yên leşkerî, çi jî yên siyasî nikarin azadiya gelan bipejirînin. Lê ne dûr e, pir nêzîk e gelên Îranistanê û di pêşî de gelê Rojhilatê Kurdistanê wê şoreşa azadiyê di hundirê Îranê de firehtir bikin. Ya din, eger rêjîma olperest a Îranî ji van siyasetên xwe yên ku dijîtiya gelan dike venekşê, ew jî dê mîna Sûrî, Yemen û Lîbiya bibe.

Di vê navberê de, ji ber ku doza gelê Kurd di qonaxeke pir nazik û hestwar re derbas dibe. Ji ber wê jî zor pêwîst e ku rayedarên kurdan jî van nameyên ku ji aliyê rêjîma Îranê û ya Tirkiyê ve derdikevin baş bixwînin, û lêvegereke bi berpirsiyarî ji rewşa kurdî re bikin, û lihevkirineke stratîjîk ji tevgera xwe ya siyasî re peyda bikin. Nemaze di vê dawiyê de, piraniya dewletên ku destlatdariya Kurdistanê dikin, siyastên xwe yên herêmî û cîhanî diguhêrin, û hin ji sedemên van guhartinan ew e, ku careke din doza kurdî bincil bikin. Lêborîna Erdoxan ji Potîn re û geşkirina têkiliyên leşkerî yên Tirkiyê û Rûsiya, hevdîtinên ku di navbera Îran û Tirkiyê de çêdibin û şivlivên ku ji aliyê Si`ûdiya Erebî ve tên kirin, ma glo têne çi wateyê?

# Partî û çarçewên kurdî ..... Kul û Êş.

Nûşîn Bêcirmanî



Di 14ê Hezîrana 1957an de, yekemîn partî di Sûriyê de, li ser destên ronakbîr û welatperwerine kurd hate damezrandin; û ji bo hişyarkirina gelê kurd li hemî deverên Sûriyê yên ku lê dijîn, wan bi rengekî çalak û li pêş karê xwe berdewam kirin, ta asteya ku navê partî ji kesê kurd re bû weke rûmeta herî bilind û birêz. Ev jî bû egera ku bi hezaran kurd tevlî vê partiyê bibin . Piştî demeke ne dirêj bi şûn de, nakokî û asteng di navbera endamên serkirdayetiya partiyê de peyda bûn; di encamê de, endamên vê partiya ku gelê kurd xwe li dorê dabû hev û baweriyeke xurt pê anîbû, dest bi parçebûn û dabeşkirina wê kirin, ta ku jimara partiyên tevgera kurdî li Sûriyê gihaye radeyeke ku ew nema bi navên xwe, lê belê bi navên sekretêr an serokên xwe têne nas kirin. Ev jî di jiyana siyasî ya gelê kurd li Sûriyê de nîşaneke xerab e.

Bêgoman, ev parçebûn bûye pirsgirêk û nexweşiya herî mezin; çareseriya wê û pirbûna partiyên kurdî ne kêmî doz û pirsgirêka gelê kurd di Sûriyê de bi xwe ye. Beşekî mezin ji kar û xebata ku tê kirin, di ber yekîtî û nêzîkbûna partiyên kurdî ji hev re tê rijandin. Bi vî hawî jî, pirsgirêka gelê kurd ya sereke bo bicîkirina mafên xwe yên rewa, tê jibîr kirin.

Ji encamên xebat û têkoşîna di ber çareserkirina vê diyardeya neyênî de, mijara yekîtiya partiyên kurdî bû xewneke dûr û bê hêvî. Ev dabeşkirina bê sînor di nav endamên laşê tevgera Kurdî ya siyasî de, bû yek ji sedemên damezirandina çarçewan ji hin partiyên tevgera Kurdî, û carina jî beşek ji kesên serbixwe tevlî dibin. Di Buhara sala 1986ê de Hevbendiya Demokrat ya Kurdî li Sûriyê ji bal 3 partiyên ve hate damezrandin. Lê mixabin, hin nakokiyan di hindurê wê bi xwe de jî serî hildan. Ji wê rojê û vir de çarçewine din hatin avakirin. Eger pirbûna hejmara partiyên Kurdî bûbû kelemek di pêşiya çareserkirina doza netewî ya gelê Kurd de li Sûriyê, êşeke din e girantir lê zêde bû, çunkî ev çarçew bi xwe jî weke partiyên kurdî çi kêm, çi zêde şerê hev kirin, û di hin waran de jî li ser gelek tiştan bi hev re daxivîn, û carina jî li ser pir mijarên kesane, ne yên giştiyane, li ser berjewendiyên teng ne yên netewî, ne jî yên gelêrî li hev dikirin. Ev babetên giştiyane yên herî dawî bûn di giringiya danûstandinên hevbeş de. Ev ji hêlekê ve, ji hêla din ve, çi parçebûneke nû ku çêdibû, du beş tanîne holê, yekî li vê çarçewê cih digirt û beşê din jî tevlî yeke din dibû. Herwiha jî, wan çarçewan rewatî didan vê partiyê an ya din, û her partiyekê ev çarçew an ya din weke mêrg ji xwe re didîtin, û hebûna xwe di hebûna wê de didîtin, tevî ku ew partî 10 nefer bin jî, lê navek û sekretêrekî wê heye, eger ne ji wan çarçewên ku tê de bi cî dibin, wê ti rol ji wan re tune ba. Li vir gelek pirs di derbarê van diyardeyên çewt û xerab de xwe davêjin holê.

1- Gelo jimara gelê kurd li rojavayê Kurdistanê, hewcedarî van partî û çarçewên heye ye?!! Pirseke gelek giring e ku mirov ji çi kesekî kurd bipirse, wê bersiv di cî de bi (NA) were, û heye ji gelek endamên van partiyan bi xwe jî be ; naxwe pirsgirêk li kû ma?!!

2- Gelo, rêxistinên van partiyên ku hene, li seranserî heremên Kurdî li rojavayê kurdistanê hene yan na? Dîsa jî NA, çikû partîne kurdî hene herêmkî ne, lê li heremên din ne nas in ; naxwe ev jimar ji bo çi ye? Bêguman, bersiv diyar e. Her partiyek di ecendeyên vê partiya Kurdistanî, yan jî yeke din e sereke di Rojava de bi piştgiriya wan jê re xebata xwe dike.

3- Gelo, pirogramên siyasî yên van partiyên ji hev dabeş bûne, ji hev cuda ne yan na?

4- Gelo, piraniya van partiyên kurdî sûde dane tevgera kurdî, yan jî xizmet ji çareserkirina doza gelê kurd re kirine? .......7

# Rexne: Têgih û Wate

Dilovanê Deştê

"Rexne" zaraveke (têrmek) zimanwerî ye, ku di alî û penavên jiyana rojane yên curbicur de bikar tê. Li wê gorê jî, ew pirwate ye. Dema ku merov li ferheng, berhem û nivîsarên zimanzan û wêjenasan vedigerê, merov baş sedem û egerên pirwateya vê zaraveyê nas dike. Rast e, "rexne" di warê tore û hunerê de bi gelemperî yek têgih wergirtiye. Di vî warî de, "rexne" bi wateya hûrxwendina deqê ji bo şêwesazkirin, şirovekirin û nirxandina deqê ji bo serastkirina şaşîtiyan û destnîşankirina tiştên baş di naveroka wê de. Lê belê, ji Aristoyê Yewnanî de û ta niha, pir zana, afirêner, wêjevan û hişmend di vê rewşê de xebitîne, û zanyarî û têgihiştinên ciyawaz di derbarê têrma "rexne" de li pey xwe hiştine. Pirbûna pênaseyên ku ji hizir û ramana vê bêjeyê re hatine nivîsandin, sergêjiyek di hin beşên zanyarî de ji xwendevanan re peyda kirine.

Vegerek li danasînên bêjeya "rexne" di hin ferhengan de, mera hin zanyariyên rengereng werdigire. Di bingeha xwe ya dîrokî de, ev zarav ji ya Yewnanî "kritikos/kirîtîkos" hatiye darijtin, û bi wateya ravekirin û şirovekirinê dihate bikaranîn. Herwiha, li gorî İxrîqiyan, ew yek ji nîşanên kar û çalakiyên mejî û hişmendiyê bû. Ev baş di Ferhenga İxrîqî ya bi zimanê İnglîzî de diyar e. Ji aliyekî din ve, ferhenga Oksford (Oxford) ya İnglîzî wiha gotiye: "Berçavdanîna kêmasiyên tiştan û diyarkirina şaşîtiyên wan". Hin ferhengên din, wekû Muncid a Erebî, di danasîna "rexne" de wiha dibêjin: "Rexnekirina axaftinê diyarkirina başî û nebaşiyan (şaşîtiyan) e. Hinan jî "rexne" tenê bi destnîşankirina şaşîtiyan ve girê dane.

Zimanzan û peyvnasên Kurd jî di ferhengên zimanê kurdî de li ser peyva "rexne" baş rawestane û ew dane nasîn. Kamêran Botî yek ji wan peyvnasan e, ku di ferhenga xwe ya Kurdî-Kurdî, Spîrêz 2006, çapa yekem de wiha dibêjê: "Rexne: Destnîşankirina şaşiyan û diyarkirina rêya çarekirinê ye. Rexnya avaker; jibo baştirkirina dozê ye. Rexneya kavilker dibit egera têkdanê û ajaweyê. Umîd Demirhan jî li ser vê zaraveyê rawestaye. Ew di Ferhenga Destî: Kurdî bi Kurdî, Çapa duyem, Sewad 2007 de, têrma "rexne" wiha didê nasîn:"Destnîşankirina şaşiyan û diyarkirina riya çareserkirinê. Rexneya avaker: Rexneya ku ji bo başkirina temtêlê tê kirin. Rexneya kavilker: Rexneya ku bi mebesta ajaweyê tê kirin e.

Rexne wekû ji van têgihên borîn diyar e, yek ji çalakiyên hiş û mejî ye. Ew di derbarê şêweyekî wêjeyî, rêbazeke ramyarî yan jî kiryar û helwestên merovan tê bikaranîn, da ku başî û rewayiya



heyî bide xuyakirin ji bo sûde jê bête wergirtin. Herwiha jî şaşî, nebaşî, sextebaz û lawaziyê destnîşan bike, ew hemî jî ji bo serastkirin rewakirina wan. Pêdivî ye em zanibin ku nirxandina keresteke, kiryarekê yan mijarekê bi destnîşankirina erênî û neyîniyên wê tê pêkanîn, da ku başî bêne çespandin û şaşîtî bêne çareserkirin. Herwiha, jîngeha rexnê û rexnedariyê civakeke bi rêkûpêk û pêşketî ye, çunkî ew bi hiş û hişmendiyê bi xwe ve girêdayî ye. Bêguman, civakeke wisa wê di warê çand û şaristaniyê de jî pêşketî be. Lê, ka em vê pirsê ji xwe bikin: Gelo herkes dikare bi karê nirxandin û rexnedariyê rabe? Yan jî hin merc têne xwestin da ku sûde jê bête wergirtin?

1- Yek ji hêmanên herî girîng di vî warî de ew e, ku divê kesê rexnedar mijarê baş nas bike, da ku karibe bi şêweyekî zanistî wê mijarê yan kiryarê binirxêne.

2- Pêwîst e ku rexne bi xwe erênî be, ji bo bibe binetara wergirtina encamine rast û durist.

3- Pêdivî ye ku rexne bi xwe nelayene be, bi vî awayî ew dibe cihê bawermendiyê.

4- Pêwîst e ku rexnedarî li ..

8

### Têkoşîna ... Dûmahîk

rewşên siyasî ên nû û guhertinên mezin ku li seranserî Kurdistanê û Rojhilata Navîn û cîhanê çê dibin, û li hember serhişkiya sazûmana Îranê li derbarê mafê çarenûsî yê gelê Kurd, û mandelkirina hemî mafên wî, em neçar bûn, û me biryara xwe da ku em çalakiyên xwe yên çekdarî bi rêkûpêk, fere û bi hêztir bikin, ta sazûmana meleyan li mafê gelê Kurd di federaliyê de mikur were. Gelê me yê Kurdistanê jî bersiveke erênî û fere da bangewaza partiyê û gêncên Kurd bi hejmarine mezin tevlî rêzên pêşmergeyan dibin. Di vê pêngavê de, armanca me ew e ku em xebata çiyê û bajaran bigihînin hev, û wan bi hev re bajon û geş bikin, ta em digihên armanca xwe di azadiya Kurdistanê û demokratîkbûna Îranê de. Wekî ku hatiye naskirin, û li gora ku jêder dibêjin, baregeha sereke ya pêşmergeyên PDK-Î jî li nava sînorê Başûrê Kurdistanê li Çiyayê Qendîlê ye.

Hêjayê gotinê ye, ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê (PDK-Î) li 16ê Gelawêja 1945'an li Mehabadê hate damezrandin. Serokê PKD-Î yê yekem Qazî Mihemed bû. Piştî damezrandina PDK-Î bi çend mehan, wê li 22'ê meha Rêbendana sala 1946an, yekemîn komara kurdî li rojahilatî Kurdistanê bi navê Komara Kurdistan ku paytexta wê bajarê Mehabadê ragihand. Piştre PDK-Î li salên 1967-68 dîsa bi xebateke çekdarî li dijî destlata Şahê Îranê rabû. Û piştî raperîna xelkê Îranê dijî deselata şah li sala 1979an, PDK-Î û Komele Kurdistana Rojhilat kirin bin destê xwe û Kurdistan azad kirin, lê mexabin li sala 1983an, û piştî 3 salan ji şerê qurs [giran] di navbera Pêşmerge û arteşa Îranê de, careke din Kurdistan ket bin destê deselata Tehran, û zulm û zorê jî li ser gelê Kurd berdewam kir.

### Gelê Kurd ... Dûmahîk

rêyên hevdîtin û diyalogê di navbera biran de dixetimîne. Bi her hawî, girtina kesên siyasî yên bi şêweyên aştiyane têdikoşin cihê nerazîbûna me ye, bê derengî û bê dudilî, divê ew ji zindanan serbest bêne berdan.

Di vê çarçewê de, serokomarê Tirkiyê Receb Teyib Ardoxan ê ku êşa wî ya giran û derdê wî yê herî mezin pêşketina doza gelê Kurd li rojhilata navîn e, li vê dawiyê, ji neçarî karîbû ta radeyekê, têkiliyên dewleta xwe bi Rûsya û Israyîlê re xweş bike, û hewl dide wan bi Misrê re jî vegerîne. Diyar e ku mebesta wî ya sereke ji vê tevgerê astengkirina doza kurdî li Sûriyê û têkbirina destkeftiyên gelê Kurd li vî parçeyî ye. Pêwist e tevgera rêzanî ya kurdî li Sûriyê van gef û metirsiyan bi berpirsiyarî bibîne, û li hemberî wan, nakokiyên xwe piştguh bike, bê derengî, li xwe vegere, ji bo doza gelê xwe yê bindest rêzên xwe bîninser hev.

Li dawiyê, bi hatina bîranîna 59-emîn salvegera damezrandina yekemîn partiya Kurdî li Sûriyê, em gelê xwe û hemû xebatkarên wî pîroz dikin, hêvî û omîda me ew e, ku di zûtirîn dem de, li seranserî Kurdistanê, rûpeleke nû ji têkiliyên biratî û dostaniyê re vebe, û ji bo lihevkirin û yekrêziyê xebateke îjdil dest pê bibe, êdî kurmê darê ji darê derkeve û nema vegere! Û dawî li jiyana koletî û bindestiyê were!...

### Partî û ... Dûmahîk

5- Ma partî û çarçewên kurdî bi giştî doza yekîtî û yekrêziya kurdan dikin, yan di piraktîkê de dîse bi giştî vê nakin? Yan jî berûvajî vê, destên xwe li pişta yên ji hev cuda didin, dixin û rewatiyê didin vî yan wî?

Di dawî de, gelek pirs û goman di serê her kesekî kurd de peyda dibin; lê gelo, çareserî çi ye ?

Gelek êş û piroblem hene bi demokratiyê her tuşt çareser dibe. Ya giringtir, em partî û çarçewên kurdî weke kurdine Sûrî li xwe binêrin, rê li pêş destêwerdanan bigirin ji kû werin bila werin, ku xerabiyê di navbera me de bikin û me ji hev re bikin neyar.

Gelo, wê kî ji me pêve karibe me nêzîkî hev bike, yan jî me dûrî hev bike. Em zanibin kengî û çawa em ji hev ciyawaz bin, emê vê doza ku me avêtiye ser milê xwe bi rêve bibin û bigihênin çareseriya ku ji gelê me re meraq û hêvî ye; hingî emê ji gelê xwe û doza wî re xweş xizmetkar bin.

# Şoreş û erêniyên guhertinê

Îlham Osman

Dibêjin.. şoreş guhertin e.Piştî şoreşa Sûriyê di sala 2011ê de miletê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe rastî guherînên bingehîn hatin.Di jiyana rojane de pereseneke تحولji kok û binyad de di bawerî, çawaniya danûstandinê bi bûyarên nû û jiyana civakî ya normal de pêk hat. Pir caran ew peresena ne li gorî nêrîn û daxwazên me bûn, lê ta ku em wan guherînan di trezoyeke dadî de bipîvin, divê berê me li ber guherînên erênî bin ta ku berteka me jî li hember vê tevliheviyê erênî be. Hinek ji wan guherînan nirxine nû li civaka Kurdî bar kirin, ango rûyê civaka Kurdî ji lawazbûnê şuşt. Mirov dibîne ku hema hema hemû kesên malbatan tevlî kar û baran bûne, nemaze jina Kurd. Wê xwe di cihên pisporiyê de dît û dijwariyên aborî li rex mêran kişand û hewildanên xwe kirin ta ku çareseriyê ji astengî û tengiyên rojane re bibîne,belkî eger ne ev rewşa ba, tucarî malbatên girtî rê li pêş keça xwe venedikir ta ku ew kesayetiya xwe ji xemsarî û jibîrbûnê rizgar bikira.Weke mînak ew xwe di karên nû de li ber xwe dide çi di rêveberî, asayiş, ajokarî û asayişa trafîkê. Tevlî kêmasiyan lê wê xwe bi dunyayê naskirin da. Ji aliyekî din ve ne tiştekî hindik e- nemaze piştî piştguha ku me tê de jiyan kiri bû- îro li Efrînê cara yekem e di dîrokê de zanîgeh û dibistanên Kurdî bi zimanê zikmakî dixwînin,ev xewna her Kurdekî bû. Zêdetir



navên kargehan, dukan, gund û navçeyan bi kurdî vedibrûsin. Xala girîng ku em ji bîr nekin, ew ewlehiya ku navceyên Kurdî ta astekê tê de dijîn, tekez dike ku Kurd nayên xopandin û bi cangoriya ciwanên leheng sînorên welêt diparêzin. Eger em rewşa navçeyên Kurdan li ber çav bigirin, emê bi erêniyên guhertinê hestiyar bibin.

---

**Rexne ... Dûmahîk**

gorî cih û dema mijarê bi xwe be; çunkî her nîrekî taybetmendiya xwe heye.

5- Hebûna baweriyê di navbera kesê rexnedar û xwediyê mijar yan kiryara cihê rexnê de gelek pêwîst e.

6- Girîng e tiştên erênî pêşî bêne gotin û nirxandin da ku baweriyê li cem rexê din peyda bike.

7- Pêdivî ye ku rexne rûbirû bête kirin, ji bo kunebê sedema kîn û tengijînê.

8- Eger rexne li kesekî bête kirin, pêdivî ye ku mafê wî yê berevaniyê di ber kiryara xwe de parastî be, çunkî dibe ku berpêkine rewa ji şaşîtiya wî re hebin.

9- Pêdivî ye ku jîrbûn û zanebûna kesê rexnebar ji bîr nebin, û rexnekirin jî li gorî asteya zanebûna wî be.

10- Divê rexnedar nerînên xwe ji bo serastkirina şaşîtiyan eşkere bike.

**Di pazdemîn ... Dûmahîk**

* Bi seyranên taybet ji ciwanan re radibû.

* Belvoka PERWAN bi zimanê Kurdî û Erebî ji bo afrandin û berhemên ciwanan diweşand.

Hêjayî gotinê ye, ku em bêjin (24) hejmar ji belavoka PERWANê hatin weşandin, deriyê Perwanê ji berhemên ciwanan re vekrî bûn.

Yên ku bixwaze li belovoka PERWANê veger e, wê bibîne ku mebest ji perwanê tenê geşkirina hestê netewî û hezkirina çand, ziman, dîrok û jiyan mirovatiyê bû, li dijî ezîtiî, hişkbawerî û tuxumperietiyê bû, mijarên ku dihatin weşandin di çarçewa perwrdekirin, zanist, dîrok û wêjeyê de bû, ji mijarên siyasî û hiştengiya partîtiyê dûr bû. Mirov dê ji rastiyê dûr nekeve ku PERWANe yekem belavok ji deng û berhemên ciwanan re bû.

Gelek caran komeleyê bang û daxuyanî belavkirin, daku tevgera kurdî jê re bibe palşpişt û alîkar, lê mixabin wan bangan cihê xwe nedigirt, ji loma kar û barê komelê hin bi hin sist bû, tenê ev projeya hêja ku dê di rojên îro de ji tevgera kurdî re bi ciwanên xwe palpişt ba, di nav qabên tozik û armanca wê û di nav rûpelên PERWANê de maye.

# Di pazdemîn salvegera damezrandina wê de,

# Ronîkirin li ser Komela ciwanên Kurd li Sûryê (komele)

Mihemed Zekî Mihemed.

Piştî xebata bêtr ji salekê di hemî herêmên kurdî û deverên ku kurd lê dijîn de, li ser pirojeya avakirina çareçewkê ji ciwanên kurd re, ewên ku roj bi roj bê vîna xwe ji civak , çand û kelepora kurdî dûr diketin, û di bin fişarên rijêmê de li dibistanan, ew tevlî (Şebîbete Esewra) û partiya Be'is dibûn.

Xebatek bê westan di ber vê yekê de hate kirin. Ev projeya kurdperwerî bi firehî hate şirovekirin, û ciwanan xwe li dora wê kom kirin, ji ber ku wan didît tenê ev proje di rajeya avakirina kesyatiya ciwanan de ye.

Di 30- 5-2001 ê de bi çavdêrî û serpeştiya Partiya Yekîtî ya demqrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtî), û bi beşdariya nûnerên ciwanan ji hemî herêmên kurdî û ciyên ku Kurd lê dijîn, civata damezrandinê li bajarê Helebê- Taxa Şêx Meqsûd hate lidarxistin, û gotûbêjên berfireh li ser tozik û armancên wê hate kirin.

Di tozik û armancan de, danasîna komelê wiha hatiye zelal kirin: "Komeleyeke ji kesên xurist yan nimayinde pêk tê, bi mebesta raje û xwedîkirina nifşê nû (Ciwan) li ser bingeha armanc û tozika komelê ( çandî, hunerî, çivakî û werzişiye ... ne rêzanî " siyasî" ye, xwedî kesayetiyeke nimayinde serbixwe ye."

**Armancên Komelê:**

* Guhdan û hîlet bi ciwanan di rêya geşkirina kanînên wan yên cur bi cur di xelekên çalakiyan hemereng de ( hunerî, werzişî, çandî, xweşbuhêrk û hînkirin....HWD).

* Şiyarkirina bi erk û hezkirin û mafdariya zimanê dê, hezkirina kar û zanistiyê, mûzîk û stranê.

* Şiyarkirin, da ciwan dîrok û çanda xwe ya netewî, niştimanî û mirovatî nas bikin.

* Bo alîhevkirin û alîkariya civakê di asta xêzan û civakê de, û rewştên çak wek "alîkariya pîran, rêzgirtina sincên giştî, dilsozî bi cinawanan re, çandina daran, guhdan li paqijiyê, dûrketin ji hişbiran...." bêne navtêdan. Bi hemî rewişt û paşmayên civakê yên erênî ve werin girêdan.

* Parastina ciwnan ji diyardeyên çewt de, mîna hevdaya Tevzînokan û diyarkirina ziyana Çixarekêşanê.

* Pişikdarî di vejandina helkeftên niştimanî, netewî û cîhanî de li gorî taybetmendiyên civaka me.

* Dûrkirina wana ji cudawzî û hişkbaweriyê bi hemî rengên wê ve (Netewî, olîtî, nijadî, êlît...HWD) û rêzgirtina nerîn û tersnerînê.

* Pişkdariya erênî ji bo dewlemendkirina civaka Sûryê bi karînên ciwanên Kurd û hevkariya hevbeş û verastina pêwendiyan bi saziyên ciwanên



Sûryê yên din re, ji bo bicîkirina diyardeyên şaristanî û mirovahî û parastina ciwanan ji diyardeyên çewterê û êşên civakî.

* Komele di çarçewa rewişt û sinceyên giştî de çalakiyên xwe dike.

* Ji mafê Komelê ye, ku peywendiyên dostaniyê bi Komele û sazî û tîmên ciwanan li derveyî Sûryê re girê bide, ji hêla çalakî û taybetmendiyên ciwanan li gorî belgeyên Neteweyên Yekbûyî yên ku Sûryê li ser wan imzekiriye.

Komelê di pêvajoya xebata xwe de bi dehan çalakiyên berçav û balkêş kirin e:

* Bi sedan ciwanên kurd fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî kirin.

* Sal bi sal ciwanên kurd yên di pola 9-12 an de bi ser diketin di riya şahiyên rengereng de xelat dikirin.

* Derçûyên peymangeh û zankoyê jî xelat dikirin.

* Mehane şevbuhêrkên çandî rewşenbîrî (dîrok, ziman, navdarên kurd, mafnasî û mûzîk....HWD) lidar dixstin..

8

## Hestine Keyandî

### Vejîna Kurd

Li ser singê asoyeke bi êgir pêçayî, tivinga min ala serkeftinê li ba dike, toza koletiyê ji dawa dîroka hêsirbarandî dadiweşîne û bi baxê hêvî û mizgîniya salan bişkovkên azadiyê, di miltanê welêt yê pînekirî de vedike. Belê.. şoreşvan im, nijadê min pêt û agir e, ji bêfilên lehengiyê pekiyame, şîrê pêdariyê, yê ku min ji pêsîrên çiyayên bejinbilind mêtine, di xwîn û damarên min de meyiye, tizbiya çîrok û destanên lehengiyê, ya ku bapîrên min bi stuyê dîrokê ve daliqandine, ez fêrî abeya jiyanê kirime. Îro ezmûna jînê ez kirim striyê çavê neyaran, min jî malzaroka welêt bi çîrokên qehremaniyê xelat kir.. li eniyên şer, tîrêja xewna azadiyê ya bê hempa xwe li her tiştekî diqelibîne, hilmeke germ min dipêçe, kaniya coşê li deşta giyanê min bi hêz diherikîne, ez dibim çakûçê destê Kawayê Hesinkar, û mîna şêr û bazan, li daristana tariyê, nêçîra rovî û çavsoran dikim, tola stêrkên rijiyayî, yên ku axa şêrîn bi xwîna xwe av dane distînim û di kavilên temenê vala de çireyên coşê vêdixînim. Lîstokên ku di destê zarokan de şewitîne û tîbûna çavên dayîkên şehîdan riya min di jînê de rastir kirin, û vedenga nalîna welêt ez bi ser hev de guvaştim, hingê ez hestewar bûm ku berxwedan heyîna mirov e, xewn û sîberan vedijîne. Hêz û vîna min li deşt û newalokên eşqa yarê diçêrin, eger carina vîna min diçelmise, yan ramaneke piştxûz per û baskên kevokên hêviyên min dirûçiqîne, ez dilê xwe li ser palgeha bîranînên têrevîn vedihesînim, û di peyala çavên yarê de kenê welatê xwe dimeyzînim.. Li her sibehekê, ez rûyê xewnên xwe bi gulava eşqê dişom û mîna dewê keyandî, peyalên ronahiyê bi ser lêvên tî ve dikim, û li berbanga azadiyê, serkeftinê dikim gurzeke gul û reyhan û diyarî yara dilê xwe dikim.. belê.. welatê min yar e, û yara min welat e.

## Aşvanê Bîranînan

### Zozan Ebdo

Mîna kulîlkek bêhîvê ji bedena darê ketiye bîrê, mîna zarokekî dûrî hembêza diya xwe diqîre, mîna perperîkeke bask şikestî di bêdengiyê de hesretan bi tiliyên xerîbiyê dihûne, mîna guleke çilmisî di rûbara aveke biyanî de, rewşa wî jî wisa ye. Rewş koçer, penaber û sêwiyê welatê xwe, yê ku ji welatê xwe dûr, tu carî nikare serê xwe vehesî dîne ser balgiyê jiyanê, tu lê meyze dikî tu dibînî weke her heyînekê di dunyayê de jiyana xwe didomîne, belkî hin caran jî dilê te bi wî bimîne û tu bixwazî parek ji jiyana wî ya li derve bi dest te bikeve, lê ger tu têkevî gola hestên wî û kûrkûr di nava zeviyên giyana wî de bimeşî, tiştek ji xeynî rengê xaliyê awirên çavên te napêçe, û tu nizanî çawa xwe ji rêwendabûna banokên wî yên tevlehev biqetînî, ji ber ku hîngê tu kûrahiya mirovekî ne li gorî daxwez û hêviyên xwe dijî dikolî, tu tê dighêjî ku ew jiyanê nake, lê xwe dide jiyankirinê. Erê! Xwe dide jiyankirinê... ji ber ku di nava çolistana rewana wî de, dilopeke av bi ezmanê xerîbiya wî ve daliqiye, dibe ku ger rojekê vegere welatê xwe, dê rengê xaliyê vegerîne hefterengên bûkabaranê. Tu tê dighêjî ku di şevên dînok de çirûskek hêviyê, riyên vegerîna wî şil dike. Çiqas penaber li derveyî xaka welatê xwe dûr...dûr bimînin, atomek ji welêt nayê guhartin, çîveçîva çûkan, xumxuma rûbar û çeman, serfiraziya çiyan û çîrokên evînê yên ku xwe ji xweşikahiya zozanan tîmar dikin.... nayên guhartin, tevlî wê hîna êş û jarên penaber, xemlîneke zêdetir bi ser welêt de diweşînin, û çêşa jiyanê di nav mijangên welêt de şêrîntir dikin. Penaberî ew e... Tu biçî û li paşriya xwe binêrî, ku tu gulekê biçînî û tu nizanibî wê kengî ev gul bibişkive û wê bêhneke çawa bide. Penaberî....biyanî ye, biyanî jî ew e... Tu di riya şevan re bimeşî, lê tarîtiya wan şevan bihêle tu bawer bî, ku tu yê porê berbangê di rojekê de bi ser çokên xwe de berdî, û di ber awaza bextewariya xwe re, tiliyên xwe bi nazikî di nav de sermest bikî û pê şa bibî.

**Hevpeyvîn ... Dûmahîk**

ku Rûsya dawiya dawî, di derbarey Turkiyê û hevalbendên wê yên Natoyê de, xwedî pîvanên zor nazike. Eger Heleb serûber bikeve destê rijîmê, Rûs û Îraniyan, rê li ber siyaseta derve ya Turkiyê teng dibe, û pêlên nû ji koçberiyê berê xwe didine sînoran, û vêca parêzgeha Idlibê, ya ku bi Rayhanliya Turkiyê re bi her hawî vekiriye, û çeteyên El-Nusre tê de desthilatdar e, dê bibe meydana aloziyeke mezin û şerekî berfereh.

**6- Li ser deriyê Sêmalkan pir gengeşî çê dibin, bi rastî gor we pirsgirêka derî çî ye?**

Bona girtin, şert û mercên jinûve vekirina deriyê Sêmalka ya li ser çemê Decle navbera (Başûr û Rojava), li Hewlêrê di civîneke ragihandinê de daxuyaniyeke fermî bi Kurdî li ser navê serokatiya herêmê hate belavkirin. Em di wê baweriyê de ne ku berdewamiya girtina vî derî, rê li ber jiyana rojane ya xelkê sivîl teng û dijwartir dike, û dibe sersebeba gurkirina nakokiyan, û nakeve warê çareserkirina pirsgirêkan. Hêvî û daxwaz ew e ku veger li biryara girtina derî bibe, û îro berî siba vebe, da ku xelkê Kurd, çi li Dêrîkê û çi li Zaxoyê nebêjin deriyê Sêmalka bûye Xerabmalka.

**7- Têkîliyên TEV-DEM û ENKS ê payê diyarkirina federalîzmê çawa ye? Vegera pêşmergeyên Rojavaewê çewa be?**

Piştî ragihandina pirojeya Federalîzmê, li Qamişlo bêtirî carekê hewildan çêbûn, ku civînek berfereh ji hemî partî û pêkhateyên siyasî re lidar keve, û piranî beşdardibûn, çi nûnerên partiya me ligel Hevbendiya Niştimanî Ya Kurd Li Sûriyê, çi partiya Pêşverû, Tev-Dem û partiyên dî. Lê hevalên ENKS beşdar nebûn, bê ku sedeman bidine xuyakirin. Vêca ev nebeşdarî li civîneke weha ciyê nerazîbûna piraniya rewşenbîr, welatparêz û siyasetmedaran bû. Bo me, baş xuya dibe ku berdewamiya endametiya ENKS weke beşek ji siyaset û helwestên kiwalisyona opozisyona Sûrî (Itîlaf), rê li ber lihevkirin û yekrêziya Kurd venake.

Beşek ji wan ciwan û ciwanikên Kurd ên Sûrî yên ku ji ber şerê li Sûriyê û bêkariyê, ji neçarî berê xwe dabûne herêma Kurdistana Îraqê û li wir mane û dijîn, bi navê (Pêşmergên Rojava) hatine nasandin. Hin caran bona piropaganda partîtiyê û çalakiyên ragihandinî têne bikaranîn.

**8- Kurd seranser beşdarî civîna Cenevê ne bûn. Sedema wê em karin bêjin ji ne yekîtiya Kurdan bû?**

Bêguman, gava tevgera Kurd li Sûriyê, lihev, yekrêz û yek xîtab ba, dê karîba weke şandeke yekgirtî û rêzgirtî li hemî civînan beşdar ba, û nûnertiya gelê xwe bikira. Tevî ku mirov di wê baweriyê de ye, ku çi rijîma Baas, çi jî desthilatdariya AKP û beşek ji opozisyona Sûrî, dê bi her hawî asteng çê bikirina.

**9- DAÎŞ û tevgerên wek wî têkherin, îhtîmala şerê navbera Kurd û Ereban heye?**

Rijîma Baas, dê hewil bide ku Kurdan û Ereban bîne hember hev û li ser nakokiyan bilîze, û dijatiyan di nav pêkahteyên civakê de peyda bike û gur bike. Di vî warî de dikarim bêjim, pêkhateya Kurd li Sûriyê bi hemî rêxistin û partiyên xwe ve, aştiya civakî diparêzin, bi dostanî û biratiya gelan re ne, û hişyarin.

**10- Wek hûn jî dizanin dewleta Tirk nêzîkî 5-6 mehane hember gelê Bakûrê Kurdîstanê şerekî dijwar pêktîne û PKK jî di bajaran da xweserîya çekdarî dîyar dike. Hûn di derhekê vê pêvajoyê de karin çi bêjin?**

Daxuyaniyên fermî yên desthilatdariya AKP ê ji raya giştî re, bi zelalî gotine û dibêjin (( Em dê şer û hêrişan bidomînin heya em dawiyê li PKK bînin ….)). Li gor şopandin û zanyariyên di destê me de, AKP û dewleta Turkiyê gelek caran pejirandiye ku li gel PKK têkildarî û hevdîtinan çê bike, çi yekser li Oslo, Îmraliyê, Qendîlê, û çi di riya Parlomentoyê re, û di vê çerçewê de endamên komîteyeke aqilmendan li Turkiyê hatibûne binavkirin, ji bo pêvajoya çareseriya aştiyane, û dukomentek bi navê belgenameya (Dolme bahçe) hatibû holê … HWD. Lewre, etmosfêrek erênî û hêja li seranserî Turkiyê û Kurdistanê cî digirt û belav dibû, û piraniya hemwelatiyên TC şahî û razîbûna xwe ji vê pêvajoyê re didane xuyakirin, ji bilî hinde hêz û kesên nijadperest, sergerm û paşverû, ku hê li serê xwe siwar bûne û dibêjin (Li Turkiyê pirsa Kurd nîne, pirsa Terorê ye û hew).

Xuya dibe ku Turkiyê berê xwe ji zarzimanê diyalog û şêweyên çareserkirina aştiyane guhartiye û paşda vedigere.

Spas, rêz û silav ji berpirsyar û karmendên NEWROZ ê re.

**Efrîn 21.05.2016 an**

# Zarokatiya windayî

Nazdar Hesen

Zarokatî di jiyana mirov de qonaxeke pir girîng û bingehî ne. Ji ber ku hişên zarokan ji hilgirtina agahiyan re amade û vekiriye, wek rûpeleke spî, her tişt li ser tê nivîsandin, bi taybetî, bûyerên balkêş ên tê re derbas dibin.

Pir zanyariyên derûnî dibêjin: Ta hin peyv bandorê li ser kesayetiya wan di pêşerojê de dike. Ji ber ku zarok pêşeroja civakê ne pir lêkolîn li ser wan çêdibin, da ku mafên wan biparêzin û di avakirina kesayetiya wan de alîkar bin, ji bêtirîn rêxistinên di vî warî de dixebitin , ew li dewletên pêşketî hatine damezrandin, lê li welatekî wek welatê me Sûriyê hin mafên zarokan parasitî bûn, lê ne wek daxwaza rêxistinên navdewletî ya parastina mafên zarokan bû, lê dema kirîza Sûriyê dest pê kir roj bi roj mafên wan qelis bû ta tu maf ji wan re nema, û ev qonaxa herî xweşik û şêrîn ji temenê wan, winda bû, lewra dema tu zarokekî dibînî û jê re dipeyvî tu dibê qey tu ji mirovekî temen mezin re dipeyvî, xem û giraniya cîhanê li ser milên wî ne. Bi tevahî, jiyana wan hatiye guhêrîn, lîstokên wan bûne alavên cengê, çêrokên berî xewê li ser hejimara kuştiya ne, erkên wan dibistanî: Çawa pêdiviyên rojane peyda bikin???

Mûzîk: Dengê topa ne , stran qêrîn û hawar e, wêne pevçûn di navbera her du aliya ne, werzîş jî bû ye rev û li ber çavên wan xwîn û kuştî dîmeneke rojane ye, lê temaşe dikin. Bi hezaran hatin kuştin yan bûne sêwî bê dê yan bav dijîn, yan ji cih û warên xwe bi dûr ketine û koçber bû ne, û ji fêrkirinê bê par mane, û bi sedan jî ji aliyên rêxistinên terorîs de hatine binçav kirin û perwerde kirin, da ku bibin leşker û di bin ala wan de şer bikin. Bi rastî ev rewşa niha ya zarokên Sûriyê tê re derbas dibin, bandora wê li ser derûniya wan dê demeke dirêj bidome û neyniyên wê li ser civakê roj bi roj ê mezintir bibe



Lê mixabin, ta niha rêxistinên navdewletî yên parastina mafên zarokan li cîhanê bê deng mane û bi xemsarî bi vê mijarê girtine. ji ber vê yekê, dema em di pêşeroja zarokan de diramin, pirsên bê bersiv xwe didin pêş.

Ma gelo:

-Çawa zarok ê jiyana xwe bidomîne?

-Têkiliyên wan ê çawa bin?

-Di pêşerojê de, çawa civak ê bi van ava bibe?

# PSK Bû Partiyeke Zagonî

Li dawiya meha Gulana borî, Partiya Sosiyelîsta Kurdistanê (PSK) destûra xebata zagonî ji şalyara hundir ya Komara Tirkiyê wergirt û bû partiyeke zagonî. Ev cara yekê ye ku partiyekî Kurdistanî bi rêbaz, dirûşm û ala xwe ya resen tê pejirandin ku dibe partiyeke rewa û di bin zagonên Komara Tirkiyê de xebata xwe ya siyasî dike.

PSK li sala 1975an hate damezrandin, serokê wê yê berê siyasetmedarê navdar Kemal Burqay ji çend salan biryrara xwe da û ji Ewrupa vegerî Tirkiyê. Sekreterê partiyê yê niha rêzdar Mes`ud Tek e, ew jî li Tirkiyê û Kurdistanê dimîne û xebata partiya xwe birêve dibe.

